



ŞAREDARÎYA  
SLAGELSE

HUN BI XÊR HATIN BEXÇÊ ZAROKAN LI  
ŞAREDARÎYA SLAGELSE

Hatîye çapkirin ji alîyê: Nordbycentret Kierulffsvej 2 |  
Center for dagtilbud

Li Danîmark pirranîya zarokan diçin bexçê zarokan heta ku dibin 6 sal û dest bi dibîstanê dikin.

Zaroka te: \_\_\_\_\_ wê dest bi Bexçê Zarokan: \_\_\_\_\_ di: \_\_\_\_\_ /  
demjimêr: \_\_\_\_\_ bikê.

Gava ku zaroka te dest pê kir, divê hun wek dê û bav rojane çend demjimêran li gel zaroka xwe li bexçê zarokan bimînin. Ev yek li gor peymanana li gel bexçê zarokan heta 1-2 hefteyan tajo. Hunê wek dê û bav bîn bexçê zarokan ji bo ku zaroka xwe bînin û bibin û herweha jî bîn beşdarî civînan bibin. Li Şaredarîya Slagelse ew adet nîne ku dê û bav bêyî destûra bexçê zarokan bîn serdana zarokan bikin.

### **Bexçê Zarokan çîye?**


Li Danîmark du bexçên zarokan ên ji bo zarokên 0-6 salî hene. Yek jê ji bo zarokên herî bi çûke (vuggestue) û a din jî ji bo zarokên mezine (børnehave). Bexçê zarokan cihekî bingehîne ji bo xwenaskirin û perwerdeya zaroka te û herweha derfetê didê dê û bavan jî ku ji xwe re kar bikin an jî bixwînin.

Perwerdeya bexçên zarokan li ser dayin û stendina sosyal, ziman û tevgera zarokan tê meşandin. Xasima jî perwerdeya ziman alîkarîyeke baş e ji bo ku zaroka te baş fêrî zimanê danîmarkî bibê û karibê dest bi dibîstanê bikê. Di herdu bexçên zarokan de zarok di bin hemî şert û mercên hawayê de him li hundir û him jî li derve dileyîzin. Bi dengekî bilind pirtûk ji wan re têne xwendin, stran tên gotin, govend tê kişandin û dîmen tên çêkirin.


Kesên mezin ku li wir kar dikin jî hemî mamosteyên pedagojîyê (pædagog) û şagirtên wan in (pædagogmedhjælper). Ew bi awayekî profesîyonel çavên xwe didin zarokan û wan perwerde dikin.

## Pêwîste zaroka te çî bi xwe re bibê bexçê zarokan?

Divê xwarina xwe, pêlavên nav malê, memik û lîstikan li gel xwe bîne – heger ku bi kar bîne.



Li Danîmark çar demên salê hene: Bihar, havîn, payîz û zivistan. Li gor demên salê baş kincan li zaroka xwe bike û li zaroka xwe baş miqatebe.



Gava ku baran bibarê, potîn, şal û çakêtê baranê tèn bikar anîn.



Gava ku berf bibarê: Pêlavên zivistanê, kincên germ, kûm û lepik tîn bikar anîn.



Gava ku bihar û havîn bê: Kinc û pêlavên hênik û sivik û çakêtekî sivik ê biçûk bikar bîne.

## Kesên pêwîst ên pêwendîdar:

Annette Pedersen pêwendîdara şaredarîyê a ji bo hemî malbatên pênaber ên ku nû hatine ye. Gava ku pirsek te di derbarê xanî, kar, dibîstan/xwendin, aborî û alîkarîya ji bo civînan û wergêran (tercûman) de hebê, tu dikarê pêwendîyê li gel Annette deynê.



Ev dîmenê ku li vir xweya dikê dîmenê Annette ye û hun dikarin bi rêya Ê-maîl û telefonê pêwendî li gel wê deynin:

Ê-maîl: [antpe@slagelse.dk](mailto:antpe@slagelse.dk)

Tlf. dîr.: 51 18 89 67

Tlf. desta: 51 18 89 67

Di destpêkê de wê du kesên pêwendîdar bi zaroka te ve eleqedar

bibin.

*Perwerdekara Sereke (primærpedagog) ewil car wek malbat pêwendî li gel we datîne. Ew berpirsyara giştî a pedagojîyê a ji bo pêşketin û tevgera zaroka te ye. Ji ber wê jî vê broşûrê bi xwe re bibe bexçê zaroka xwe û perwerdekara xwe a sereke nas bike.*

Navê wê li vir binivîse \_\_\_\_\_

Maîladresa wê li vir \_\_\_\_\_ û nûmera telefonê li vir \_\_\_\_\_

Di derbarê civînên dê û bavan de pêwendî li gel perwerdekara sereke tê danîn û ew alîkare ji bo pêşxistina ziman û bala wê li ser zaroka te ye heta ku zarok dest bi dibîstanê dikê. Heger ku pirsên we hebin û hun pêwîstî alîkarîyê bin, ew daîmen amade ye ku alîkarîya we bikê.

## **Perwerdekara ziman:**

*Perwerdekara ziman ne ji alîyê bexçê zarokan ve ketîye kar, lê ew bi bexçê zarokan ve eleqedar û girêdayî ye. Perwerdekara ziman di warê bêtir fêrkirina zimanê danîmarkî de alîkarîya zaroka te dikê û heweha beşdarî civînên dê û bavan jî dibê. Perwerdekara ziman bi zimanê \_\_\_\_\_ û \_\_\_\_\_ diaxivê.*

Navê wê li vir binivîse \_\_\_\_\_

Maîladresa wê li vir \_\_\_\_\_ û nûmera telefona wê li vir \_\_\_\_\_

Jê pirs bike di kujan demê de ew li bexçê zarokan e û li vir binivîse:  
Ji \_\_\_\_\_ heta \_\_\_\_\_

## **Ji bo ku zaroka we bi kêfxweşî herê bexçê zarokan alîkarîya zaroka xwe bikin**

Ji bo ku perwerdeya zaroka te bêtir serkeftî û bi pêş bikevê, pêwistî bi karekî baş ê hevbeş di navbera te û perwerdekarên bexçê zarokan de heye. Xasima jî di her 4 hefteyên destpêkê de. Ji ber wê jî navên zarokên din fêr bibe, pirs bike ka zaroka te çi kirîye û bala xwe bide ser gotinên nû ên zaroka xwe û navên wan bi danîmarkî fêr bibe. Heger ku tu ji perwerdekarên fêhm nekê û ji mebesta wan têngihijê di cih de ji wan pirs bike ta ku tu baş fêr bibê.

Baş jî guhdariya gotinên serpêhatîya zaroka xwe bike bê ka li bexçê zarokan çi kirîye û roja wî/wê çawa derbas bûye. Û cî jî bide kêfxweşî, neçarî, xemgînî û meraqa zaroka xwe.

Di destpêkê de, gava ku zaroka we dest bi bexçê zarokan bikê, wê perwerdekara ziman wek malbat çenteyekî bidê we. Di çente de materyalên pêwîst, ku hunê bi zaroka xwe re parve bikin, hene.

Wek dê û bav hun di pêşvebirina fêrbûna zimanê zaroka xwe de roleke sereke dilîzin. Bi zaroka xwe re bi zimanê dayîkê biaxivin. Û li vê vîdeoya ku ji bo 8 zimanan hatiye wergerandin temaşê bikin: <http://www.aarhus.dk/da/borger/familie-boern-og-unge/Pasning/Dit-barns-sprog-og-laesning/Tal-sproget-frem.aspx>.

## **Erkê bawerîpêanînê (Tavshedspligt)**

Ji bo parastina zarokan, dê û bavan û karmendên li bexçê zarokan, erkê bawerîpêanîna perwerdekarên di derbarê rewşa şeqsî de heye, ango mafê wan nîne ku tiştên nepenî ji bo kesê din re bêjin.

Agahdarîyên ku dikevin nav çarçoveya şeqsî evin:

- Nasnameya nijadî, siyasî, olî an jî bîr û bawerîya fîlosofî û agahdarîyên di derbarê endametîya sendîqa kar de.
- Rewşa tendurîstiyê û cinsiyetê.
- Agahdarîyên li ser tawanbarîyan, pirsgirêkên civakî û tiştên din ên nepenî (pêkvejîyan, rewşa aborî û zikatê û hwd.).

Bê destûr mafê tu kesî nîne ku sûretê zarokan an jî mezinan li bexçê zarokan bigrê. Bexçê zarokan bi xwe sûretê hemî zarokan digrê. Heger ku hun bixwazin dev û çavên zarokên din jî nas bikin, hun dikarin daxwaza sûretekî bikin.

## **Ewlehî (Forsikring)**

Ji ber ku hun ji aliyê ewlehîya/sîgorta bexçê zarokan nayên parastin, pêwîste hun bi xwe ewlehîyeke jîyanê ji bo zaroka xwe çêkin.

## **Alîkarîya belaş li Navenda ji bo Bexçê Zarokan**

“Pusterummet” (navenda alîkarîyê) di hemi waran de, ku tu rojane ji bo xwe zahmet dibînê, alîkarîya anonîm pêşkêş dikê. Ji mezinkirina zarokan bigre heta bi xweşî/nexweşîya zarokan û nasandina sîstema şaredarîyê derkeve alîkarî tê kirin. Heger ku tu bêtir agahdarîyan bixwazê, tu dikarê li gel psîkolog (doktora nefsi) Birgit bi rêya tlf.: 23250695 an maîlê: [nilssonbn@gmail.com](mailto:nilssonbn@gmail.com) an li gel Helle bi rêya tlf.: 30785822 an maîlê: [hessa@slagelse.dk](mailto:hessa@slagelse.dk) têkevê pêwendîyê. Demên vekirî di destpêkê de: Sêşem û pêncsem ji 14.00 – 16.00.

“Komela ji bo Dayîkên Şaredarîyê”, ku ji jinên koçber û pênerber pêk tê, alîkarîya jinan li şaredarîyê dikan ta ku kiryar û îmkanên xwe kifş bikin û bikar bînin. Ev yek jinan bi xwe, zarok û malbatên wan bi hêz dikê. Ji bo bêtir agahdarî li ser Dayîkên Şaredarîyê, tu dikarê li gel perwerdekarê pêşvebirinê Bonny bi rêya telefona desta: 30 78 58 23, an bi rêya maîlê: [bomsm@slagelse.dk](mailto:bomsm@slagelse.dk) pêwendî deynê.

“Malbat ji bo malbatê” xizmeteke/teklîfeke di derbarê civaka pirçandî de ji bo tevaye malbatê. Heger ku tu hevalên lîstikê ji bo zarok/zarokên xwe bixwazê, li pêwendîyên civakî bigerê – an jî li derfetekê digêrê ku bê pere derkevê derve û derdora xwe binasê, wê demê sîstema hevaltîya malbatê tiştekî başe ji bo te. Ji bo bêtir agahdarî li gel kordinator Heidi MC bi rêya telefona desta: 31 24 04 03, an bi rêya maîlê: [heimc@slagelse.dk](mailto:heimc@slagelse.dk) pêwendî deyne.



## “Malbat ji bo malbatê” 2011



Kesên pêwendîdar, ku navên wan li jor derbas bûn, li vê navnîşanê dimînin: **Nordbycenteret. Kierulffsvej 2, 4200 Slagelse.**

Werin serdana me! ☺ Emê bi destên vekirî pêşwazîya we bikin.

**Room for your own notes:**